

# ÊZIDIYATÎ HAVEYNÊ MIROVATIYA MEZOPOTAMIYA YE BI TAYBETÎ JÎ XIZÎNA NASNAMA GELE KURD E

Kemal Tolan



Dema ez bala xwe didime hinek berhemên nivîsakarên Cîhanê û Kurdan, ez dibînim gelek ji wan heya ku karîbûne birastî û gelek jê jî bi xêrnexwazî di derheqê dîroka Êzîdiya ye dema berî û piştî zayîna Isa de nivîsandine.

Nimûne:

1. Hinek ji dîrokzanên Cîhanê û Kurdan dibêjin: " Êzîdî bermayê Hurrî, Mîtanî, Mithraîzmî, Mazdaîzmî, Urtî, Assurî, Zerdûştî, Sabî, Budhîzmiya û w.d. ne "
2. Hinek xêr ne xwazên Êzîdîyatîyê dibêjin: " Êzîdî ne Kurdin. Êzîdî qûreşî û Emewî ne. Êzîdîyatî ji ber ola Cuhu, Mesîhî û Musilmanan zêde buye. Tû kitêb, cî û warên Êzîdîyan tûne ne û w.d. " Armanca van kesan beluye, ku dixwazin dîroka Êzîdîyatîyê hêjî şêlû bikin û naxwazin yekîtî di nav netewa û olên Kurdîstanê de hebe.

Ez dixwazim îro bi taybetî li ser şaxê di nimûna yekê de, ku dibêjin "Urartu- Orartoyan pêşiyên Êzîdîyên Xaltiya ne", li gorî zanebûn, hiş û taqeta xwe kû Xwedê û Tawisî-Melek daye min rawestim.

Gelek ilimdar, dîroknas, erdkolog û rojnamevan hene, bi delîl û gotinên şadên dîroka kevn didine xwanê û dibêjin: "gotina Xaltî anjî Haldî ji wexta dewleta Hurriyan û bi taybetî ji navê Xwedayê ola dewleta Urartu- Orartoyan tê".

Rast e li ser vê Împaratoriya Xaltîyan gelek lêkolîn hatine kirin, lê bi dîtina min tev jî bi sedemên başqê başqê û axlebên wan ne xwastine wê împaratoriye bi kokeka Kurda ve girêbidin. Li gorî baweriya min çend egerên ne gotina wan jî ev in:

1. Piraniya lêkolînavan ji milletê cînar bûne û ne xwastine wê bi Kurdîyatîyê ve girêdin.
2. Xuya ye ku kêma kesan ji wan haj ji kevneşopên Xaltîyan yê ku di nava Êzîdîyan de hê jî tene parastin hebûye.
3. Gelek ji wan jî ne xwastina kevnariya dîne Êzîdîyatîyê kifş bikin.
4. Herçiqas hineka ji wan ne xwastine bi hemda xwe di berhemên xwe de bahsa desthilatdariya li Êzîdîxan û Kurdîstanê bikin jî, lê gava ewan bahsa ol û netewên li Mezopotamiyayê kirine, ew nikarîbûne bêyî bahsa rewşa Kurdên Êzîdî gelek tiştan diyar bikin. Weha gelek ji wan mecbûr mane, bahsa xesar û zilma wan şerên ji bo serkeftina metîngehkar, neheqî û zordariya di wexta destpêka ola Zerdeştî, Yahudî, Xirîstîyanî, Musilmanetî û yê wekî dinê hatine li nava Kurdîstanê bela bûne, her wusa bahsa zilma şah, xelîfe, sultan, paşa, mîr, beg, walî, axa, jendirme û berpîrsiyarên hemu baylozخانên dewletên dagirker ku li Kurdên Êzîdî kirine, bikin.

## 5. Û hwd.

**J**i xwe, ji ber wan kêmasî û neheqiyên di dîroka me de, gelek cûdatî û nezanî jî ketiye nava me Kurdên Êzîdî û Musilman. Her weha hê jî gelek nêrîn an jî agahdariyên ne rast li ser cîh-war û baweriya dînê Kurda yê herî kevn têne belakirin. Ez bawer nakim êdî, ku tu kes ji me û dostên me dikarîbe temamiya kronolojiya dîroka Êzîdiyatîyê birêz bike .

Vêca ka werin em pêşîn birênin, bê kî ji ilimdar, dîroknas, rojnamevan û xêrxwazên Êzîdiyan, di lêkolîn û pirtûkên xwe de bahsa Êzîdiyatî û Êzîdiyên Xaltiyan kiriye ?.

### Li gorî gotina Etem Xemgin Kaldî an jî Xalidî kîne ?

1. -„Ji destpêka dewleta kurdên Hûrrî(b.z.Îs. 4000 k.t.) hetanî ya Mîtanîyan(b.z.Îs.1550 k.t.) û heta tê digîje dewleta Urartu(b.z.Îs.835 k.t.), hemû gelên heremê ji Xwedayê herî mezin yê bi navê Kald bawerdikir û di heremê de weke bawermendên Kaldi dihatine naskirin. Lêkolînavên Alman (C.F. Lehmann-Haupt û W.Belck "10 "k.t.) di sala 1898 de li Kela Şîn ya ku di nava Uşnu û Rewandîzê de lewheyê(nivîşteke) nivîsandî dibînin. Ev nivîst bi zimanê Kaldî û Assurî hatiye nivîsandin. Ev destana bahsa diyaloga di nava Melîk Kalda Işpunî û Xwedê de buyî dike. „4:58. Li ser dîroka dewlet û kronolojiya Urartu birêne li 3:124 – 141 û bi sedan Çavkaniyên di Bibliyografi ya di dawiya pirtûka Mirjo Salvini (10) de.
2. Li gorî di nivîsên Sumerîyan (yê 2350 sal b. z. Îsa k.t.) de tê xwanêkirin û dibêjên, heremên ku Gutî lê dijiyan welatê (Mirovên ku ji Milyaketê nebaş bawerdikin k.t.) bu. Evdên ku li pey vê baweriyê diçin, îro hêj di nava gelên Kudîstanê de hene“ 3:44
3. „Li gorî delîl û nivîsên di erdkolojiya li derûdora bajarê Wanê de hatine dîtin û didine xwanê, navê Xwedayê dewleta Urartu yê herî mezin Kaldî buye.( 3:137)“-

### Li gorî gotina Cîgerxwîn , Xalidî kîne ?

Cîgerxwîn pêşîn guh dide van camêran:

- „ Sîdîni Simît dibêje: di sala 1260 berî zayîne de li hawîr Gola Wanê miletekî taze bi navê Xaldî hatiye xuyakirin. Navê welatê wan Orarto yan jî Erarat bû. Gerçî raste navê wî ji me ve nehatiye xuyakirin. Lê li gora baweryêke tevayî, ku navê Xweda yê wan Xaldiyan bû. Ji lewra pêzanê tarîxê dibêjin, gereke navê vî miletî jî Xaldî bî û dibêjin, gereke ji miletên Qawqazî-Asyewî bî.

**F**on Mînoroskî dibêje: Navê Xaldî di nav Orarto yan Aşûrî de bêtir hatiye naskirin. Di serê pêşî de li çiyayê Erarat bûn û ev miletê Xaldî ye ku di sedê nehê berî zayîne de di welatê Ermenîstanê de dihat xuyakirin. Lê paşê di welatê Wanê de dewletek li darxistin û hetta bi sedê şeşê berî zayîne jî, her bi vî navî bi nîşan û rûmet bû. **Bajarê Xelat** ê dibî, ku ji bajarên Xaldiyan be .

1. Cîgerxwîn dibêje: navê Xalidi niha buye navê çend eşîrên kurd, ku bi mêranî deng dane. Êşîrên Xaldî-Kurdî, li nav Bota, Xerza û di hindama Bedlîsê de bi payedarî xwe dane nîşandan.
2. **Zimanê Xaldiyan:** Bê guman ji kurmancî pêve tiştêkî di nizanin û paytexta wan bajarê Toşpa-Wan bû. Paşê meznahiya Madiyan li ser xwe kêmasî nedîbun û xwe sipardibune pismamên xwe û bi hev re li dijî dijminê xwe şerkirine (6: 86-87)“

### Li gorî gotina Ekrem Cemîl Paşa, Xaltî kîne ?

1. -"Xaltî di sala 1500 B.M da li Araratê û Kurdistana navîn de ferweraniya Xaltî serrast kir. Ferweraniya Xaltî jêhatî, tûwana, hişdar û cengawer bu. Tospa- (Wan) paytextê Xaltiyan bu. Paş ku Xaltî li Araratan û li Kurdistana navîn bi cî bûn, pir ne çû baş xurt bûn, erdê xwe fireh kir, gihîştin Antî Torosan û milekî wan xwe gihande deryayê Reş. Îro bixwe li Kurdistanê, li gelek ciyan bermayên Xaltiyan hene."
2. Ahmet Refîq di nivîsa xwe ya dîrokê " Büyük Tarihi Umumi" di rûpel 346 de weha dibêje : "Berî ku Ermenî li heldorê Orarto- Ararat bi cî bibin, hawişekî din li van doran rûdinişt. Navê vî hawişî Xaltî bû.(7: 55-57)"
3. Kurdên Xaltî, ji Ermeniyên Penahvêj ra mêvan perweri yeke mezin kir. Ermenî ji van qencî û mihirvaniyên Kurdan pir dişû bûn. Dostaniyeke hêja di nav bera Kurd û Ermaniyan da çê bû. Ev dostanî û niwazişên Kurdan ew çend çû ku Ermenî Xudayê Xaltiyan ku navê wî "HAY" bû ji xwe ra kir "Parastek"(Mabûd). HAY, ano Zaniş, Hiş, Bîrewerî. û Ermaniyan navê xwe jî kir "HAYÎK" (7:231)"

Li gor gotina **Avyarov** "Dû eşîrên Asuriya ye kevn; Tayarî û Tuxumî ji qebîla Xalidî yê Xaçparêz bûn. Ev heta sala 1834 an jî tevî êla xwe ve li jora ava Zap ê diman û bi Kurda re yek tifaqbûn. ( 9:82)"

### Li gorî gotina Herodot, navê Xaltiya "Alarodî" ye

1. "Herodot ji wan (Xaltiya) re digot Alarod. **Alarod(Orarto,Urartu= ARARAT)** navê ciyê wan yê 829 Berî Zayîne ye. Urartu, ji yekbûna hemû Kurdên Sûbarî: Hûrî, Mîtanî, Nehrî, Mûşkî, Xaltî bûne. Ev di sala 612 B.Z. de gihîştine Imparatoriya Med. (7:302.)"
  2. "Alarodî- Urartuyî li nav sê enîşka Wan, Urmia û bahra Gökçe de diman.(8:465(79)"
- Li gorî gotina Mohemed Emîn Zekî Beg, Khaldi-Xaldi yî kîne?**

1. "**Khaldi-Xaldi**:Renge, ku ev dewleta hanê ji dawiya sedsalê nehemînî p. z. de hate bipêkhatin.

Kêr û desthilatiya vê dewleta hanê di pêla Qeralê Mînwas de bi berzbûna xwe ve hate bigihaştin. Şopên dozandî(erdkolojîyê k.t.) li ser zinarên keleha Wanê de û li dorhêla bajarê Eliksender Pol-Kemri de vekirinên pirî vî Qralî didin biderxistin. Şopên dozandî li dorhêla wî bajarî dawî de şopên wî Qralî dane bimayînkirin, mîna ku Bihiston jî şopên Dara datin bimayînkirin. (16:109)" Weha dewleta Xildî bes û bi tenha ve li ber parastina welatê kokiya Orarto de didate bikirin. Tanî nemana pêla Senharîbê bi nav û deng ve jî weha Xildi bi bêdeng ve hatibûn bimayîn. Serdariya Orarto tanî pêla Germiya (625 p.z. de) date bidirêjkirin û wê hebûna xweyî siyasî ve date biparastin. Di pişt re ew demekê di bin parastina dewleta Mîdya de hate bijiyandin. (16:110)"2. "**Xalidi- Orarto**: Renge, ku ev Miletê hanê ji demeke nenas de ji Rojhilatê Asya Biçûk ji bona devera gola Wanê hatiye bibarkirin. Ji goyên Aşurî û nemaze dozandinên şop û belgeyên girêdayî bi taybetî ve ligel şerên Sergonê Qeralê Aşuriyî duwem de tete biderkevtin, ku sinorên vê dewleta Xildi di çaxekî de ji Jor de tanî gola Kokçe û Elêksender Pol li Qefqasya de, ji Rojava de tanî rûbarê Furatê, ji Jêr de tanî Rewaduz û çaviyên rûbarê Zab û ji Rojhilat de tanî gola Urmiyê dihatin bidirêjkirin. Herwehaji wê demekî jî li Jorî Surî jî de dayite biserdarîkirin. Paytextê wê bajarê **Tospasi-Wan** bû. Renge, ku ew ji bal Qeralê Sardorîsê Yekemî Xalidî de di sala 840 p. z. de hatiye biavakirin. Vê dewleta hanê di dawiya sedsalê heftemînî p. z. de jiber xurtbûna desthilatî

û kêra Mîdya serxwebûna xwe date biwindakirin. Ew demekê li jêrdestiya wan de hate bimayîn. Di dawî de jiber biderkevtina desthilatiya Ermenî de, yên ku ew li Rojavayê welatê Xalidi de hatibûn birûniştin, ew bi carekê ve hatin biqirkirin.(16: 79)”

### Li gorî gotina Şerefxanê Bedlêse, navê Xalid ji kurê tê ?

1. -„Ew yeka li gor gotin û nivîsandinên dîroknasan eşkere û zelal e, xelekên zincîra bingeh û koka Mîrên Cezîrê digihîjin Xalidê kurê Welîd. (Xalidê kurê Welîd mêrekî jêhatî bûye û li ba wan wisan e ku dema ji xwe re bêjin em ji nesla wî ne, ew dê bibin esîlzade û pê mezin bibin. Şerefname rûpel: 494). Navê yekem bab û bapîrên wan ê ku cara yekê li ser textê Fermanrewatiya Cezîrê rûniştiye, bi navê Suleymanê kurê Xalid tê naskirin.Di destpêkê de kesên vê xanedana han ên xwedî paye, li ser rêça Dîne Êzîdîti yê û .....(Melekê nebaş k.t.) dimeşyan.( 1:156 )”

#### Li gorî gotina C. Rojbeyanî, Xalidî an jî Xaldî kîne ?

2. „ Ez di wê baweriyê de me, vê eşîretê ev bi xwe ve girêdaye, paşvemayên Xaldiyan in ku bab û papîrên kevin ên kurdan bûn. Ev yek di vê de jî tê dîtin ku heta van dawiyên, ew li ser dîne Êzîdî (Yezdanî) mabûn. Ev jî mimkun e, navê serokê eşîreta wan (an jî navê eşîra wan e sereke Xaltî be k.t.) ê pêşî Xalid bibe (1: 494.)”

#### Li gorî gotina Torî, Halidi an jî Xalidî kîne ?

1. - “Di wexta dewleta Hurriyan de, her melîkekî Hurriyan ji xwedanekî cûde cûde bawerdikirin û Xwedayekî netwî ji bo ola dewleta wan tûnebu. Piştî helweşandina dewleta Hurriyan, melîkên Urartu yan di sala 1300 an ya berî z.Îsa de dawî li wan baweriyên gelên Hurriyan anîne û ji bo netewiya ola dewleta Urartu baweriyê bi Xwedayekî seranser yê ku navê wî Haldî „Xaltî k.t.” buye qebulkirine. Ev baweriyê bi „Haldî k.t.” Xwedanê seranser heta sala 900 û 600 berî z.Îsa jî di nav olên Kurdan de gelekî bi quwetbuye.(2:18 û 22)”
2. „Wek tê zanîn navekî Êzîdiya jê „Halidi” buye. Ev navê „Halidi” ji Xwedayê dewleta Urartu tê. Weha di dîrokê de tê xwanêkirin ku qismekî Êzîdiya ji wexta dewleta Urartu ya 1300 salên berî z.Îsa hebûn e û ew heta îro hêjî hene. Wekî demên kevn didine xwanê, hingê di nava Êzîdiyên „Halidi”ya de qismekî bi navê Manî (oldar k.t.) hebûn e û ev îro hêjî di nava Êzîdiyan de xwanê dikin. Wan oldaran bi xêra sir û keramtan(Magiyan) xwe heta dema Medan parastin e.Di nava gelên Medya de, ciyê civata yên oldar (Magiciya- Maniyan) gelekî mezin buye (2: 125)”  
Li ser vî babetê manîyan birêne li 4: 133-140.

**W**eke ez ji lêkolîn û nêrînên van nivîskar û dîroknasên Kurdan yên li jorê hatine binavkirin fahmdikim, ewan jî xwastiye xwe bigihînine ser rîknên ola Kurda ye herî kevn. Dibînim tev jî di yek nêrînê de didine xwanê, ku gotina Xaltî anjî Haldî ji navê Xwedayê dîne dewleta Urartu tê û baweriyê dîne Xaltiyên ji kevnde Êzîdîti buye.

**D**ema em li naveroka dokument, sîstem, baweriyên ol û mîletên dewleta Urartuyan dirênin, em dibînin ji xeynî ku zimanê wan, wekî dinê gelek şopên Êzîdiyatîyê di nava urf -adetên ol û dewleta Urartu de xweya dikin. Dîsa gelek dîroknasên Cihanê hene û dibêjin: “Xwedayê bi navê Haldî ne tenê li ba padîşah û dewleta Urartuyan pîroz buye, ev baweriyê bi Xwedayê Xaltî hêja di dema beriya avakirina dewleta Urartuyan de jî li ba evd û dînen Mezopotamiya yê hebûye û ew hingê jî pîrozbuye. (10:39 û 183-193)” **B**elê, ji xwe dîroknasên ku dîroka dîne Êzîdî nasdikin, ew dizanên ku Êzîdî di wan herêmên dewleta Urartuyan de xwedî gelek erd û quweteke mezinbûne. Her wusa hêjî di hinek qewl û duayên me de xweya ye ku Mîrgeha Hekariya (derdora Wanê), ji berê ve ciyê sed û hedên Êzîdiyan e .

**Nimûne:**

Di dû sebeqên "Qewlê Şêx Adî û Mêra" de weha tê gotin:

**Şêx Adî xudanê keremê**

**dahir bû li erebe li ecemê**

\*\*\*\*\*

**dahir bû li beyit fare**

**qesid kir hate hekare (Çavk.:11:101-102)**

\*\*\*\*\*

Dîsa di Zargotinên Êzîdiyan de tê gotin:

**Hekarî Şêx Adî hate harî Çî bi şîrî û çî bi mertalî**

**W**eke ku di van zargotinên me de jî hatiye gotin, zelale ku neyarên dîne Êzîdî û sultanên Osmanîyan ,bi taybetî jî "roma reş" di her demê de Êzîdî qirkirine.

**Nimûne :**

"**M**urtaza paşa yê Wan ê, di sala 1127 de hûcûmî ser kela Hoşab ê dike, lê eşîrên Êzîdiyan yê li Hoşabê û li derdora Hoşabê bi tevî çar hezar siwariyên xwe ve li dijî çarsed û pêncî leşkerên Murtaza paşa derdikevin û cengeke mezin di navbêna gundê Canika û Bedehşanê de çêdibe. Di vî şerî de her 4000 siwariyên Êzîdiyan û 400 siwariyên leşkerê paşê têne kuştin. Dure dema Ballı Mehmed di sala 1128 de dibe paşayê Wan ê , ew dixwaze tola xwe ji eşîrên Êzîdiyan hilîne û ew tevî 7000 leşkerên xwe ve hûcûmî ser Êzîdiyên di herêma Abaxa bêçekbun dike. Leşkerên wî kîjan Êzîdiyên digrin dikujin û hemû malên wan dişewitînin. Demsal zivistan û herder berfbû. Gelek Êzîdiyên ku xwe di nava çîyan de veşartibun, ew di bin berfê de ji serma re dimirin. Di nava sîh rojan de hemû gund û bajarên Êzîdiyan dagirkirin. Di peyre Ballı Mehmed paşa weha digot: Armanca min ew bû ku ez koka Êzîdiyan xelazkim, lê ewan em birine ser kozikên xelet. Em ne di ser Bargiri de birine ser Êzîdiyan, hinan di bin re bi dizî xeber dabune Êzîdiyan û gelek Êzîdî revîyan. Lê ezê wan di biharê de xelazbikim.(13)"

**J**i ber ku siltanên dewleta Osmanî , paşweruyên kurd û dewleta tirkên di her demê de Êzîdî qirkirine, ew qet naxwazin meriv li tu deveran de bi rastî bahsa Êzîdiyan bikin. Lê dema ewan lêkolîn û dokument li ser dîrok û çanda Wan ê nivîsandine, ew mecbur bûne bahsa Êzîdiyan bikin.

**Ew îro jî weha dinivîsînin :**

" Di dema berî sala 1591 de 18 eşîrên mezin li Wanê û derdora wanê hebun, lê belê îro ne mumkune ku meriv rastî navên wan hemuyan bê.

Hinek çavkaniyan eşîrên li derdora Wanê weha birêzkirine:

MAHMUDIYAN , Êzîdiyên li derdora Hoşabê.  
DUMBLIYÊN BOHTÎ, Êzîdiyên li deşta Sekmenê

MAM REŞAN, li Hoşabê

BAZUKI, li Ercîşê

BRADOST, Tirgeverê

RUJIKÎ, li her deverî.....

Eşîra ŞÎKAN : (Reşî, Baravî, Mendekî, Bele, Kurtî... ev tev Êzîdîne.), (Şîkak, Dakurî, Şevlî, Ademî, Şemsikî, Mukrî, Livî, Sî çarikî...)

Eşîra ERTUŞÎ (Hertoşî) = (Weke Gevdan, Giravî, Zirkî,.... )

Eşîra DUNBLÎ (ZAZA) = (Çarik, Hormik, Lolan-haltî, Hatî...)

Eşîra HAYDARAN, SPÎKÎ(Hatî), CÎBRANÎ, HASENIYAN(Halidî).....(14)“

**D**îsa Bê guman û eşkere ye heta salên 1889-1898 an gava ku Şemseddîn Samî pirtûka xwe ya bi navê -Ansîklopediya navên bi taybetî- anjî “Kamûs’ul-A’lam” li Îstenbulê bi zimanê Osmaniyan weşandiyê û M.Emin Bozarşan ev wergerandiyê Tirkî û her çiqas ewan ne bi hemda dilê xwe jî bahsa hinek herem û hêjmara Êzîdîyan kiribin, lê Êzîdî hingê jî li gelek cîh û warên derûdora wileyata Wanê hebûne. Birêne çavkanî “15” li van navên di rûpel: 146 Imadiye, 159 Mahmudi, 190 Sencaqa Maraş, 180 Muks, 204 Ridwan, 210 Wîleyeta Siirtê û bajarên li derûdorê, 230 Wîleyata Wanê û li derûdorên wê, 240 li Xerzan, 243 Yezidi û.w.d. de

**E**m dizanin gelek kesên ji van eşîrên ku li jorê hatine birêzkirin, ji ber zilma siltanên dewleta Osmanî, paşweruyên kurd û dewleta tirkan reviyane çûne nava dewletên Soviyetê ( Ermenîstan, Gurcîstan û. w.d.) û ew eşîran heta îro hêjî tev Êzîdîn e. Min li ser vî babetî, bermayên Xaltiya yî ku heta roja îro bi çend nimûnên dinê jî di pirtûka xwe “Hebûn û tûnebûna Êzîdîyan tev romanên zindîne” de diyar kiriye ku Êzîdî heta sala 1914 an jî di wan herêmên dewleta Uratuyan de xwedî gelek erd û quweteke mezinbûne. Eşkere ye ku „Piraniya kurdên Soviyetê ji Tirkyê; Beyazîd, Bitlîs, Mûş, Diyarbekir, Êrzûrûm, Qers, Îxdîr, Mardîn, Wanê û gundên dorberê wan hatine. Piraniya kurdên li Ermenîstan û Gurcîstanê kurdên Êzîdîne. 6:34” Dîsa min di kitêba xwe de, bi taybetî ji rûpel 27 heta 103 an bahsa dîroka rewşa jiyana û eşîrên Êzîdiyên Xaltî yên ku heta îro (Gulan.2001) jî hene kiriye.

**Î**ro cardin dixwazim kevnariya ola Êzîdîtiyê bi çend sebeqên “**qewlê afirandina dinya yê**” û “**Qewlê îmanê bi çi nîşane**” diyarî dîroknas û xwendevan hêja bikim.

**“Ya rebî dinya hebû tarî**

**Têde tunebûn mişk û marî**

**Te zindî kir teze halî**

**Çû nema gul jê barî**

**Ya rebî tu hosteyê kerîmî**

**Te vekir rê û dirbê tarî**

**Tu hosteyê her tiştî**

**Bihîşt çêkir regebî**

**Erd û ezman tûnebûn**  
**Dinya fire bê binbû**  
**Însan û heywan jî tûnebûn**  
**Te xalê sazkir**  
**Di bahrade tenê hebû dur**  
**Ne dîmaşiya, ne dîmaşiya**  
**Te xaşruh anî ber**  
**Nûra xalê peydakir**  
**Goşt û ruh hatine ber**

Nûra çavan jê hate der" Berdewama vî Qewlî birêne li 11: 53-58

Di naveroka çend sebeqên vî qewlê li xwarê de jî xweya dibe ku, haveynê Êrdê pêşîn li Lalişê bi kaniya sipî hatiye avîtin.

« **Berî ne êrd hebû, ne êzmane**

**Ne Bahr hebû, ne Binyane**

**Ne Çiya hebû, ne sekane**

**Îman hebû Merîfate**

**Ewê rojê Kaniya Spî kir qublete**

**Ewê rojê Kaniya Spî kire qubleta mêrane**

**Ji berî ne erd hebû, ne ezmane**

**Ne çiya hebû, ne sikane**

**Da em medeha jê bideyn nîşane » Berdewama vî qewlî birêne li 12:74-75**

**E**z jî wekî ku di ilm û qewlê me de hatiye gotin bawerdikim û dibêjim; Heta Êzîdiyatî neyê şîrove û nas kirin, dîroka ol û mîletên li Mezopotamiya yê jî zelal ne be. Di qewl û duayên me de xweş xwe ya ye, ku Êzîdiyatî ne tenê di wexta Uratuyan de hebuye, Êzîdiyatî bingeha hemû olên mîletên Arî û Mezopotamiyê ye. Hinga ku dîrokas û lêkolînavan karibin van qewl û duayên me Êzîdiyan baş şîrove bikin û ev ewrê reşî tarî li ser dîroka ola Êzîdî rabin, dê ev kevnariya ola Êzîditiyê, ya ku haveynê mirovatiya Mezopotamiya yê û bi taybetî jî ku xizna nasnama gelên Kurd e zelal bibe.

**ÇAVKANÎ:**

1. Şerefxanê Bedlêse-ŞEREFNAME –Tarîxa Kurdîstanê ya kevn 1579-, Wegera kurmanci:ya ji aliyê Zîya Avcî ve di sala 1998 de çapa yekem a Kurmanci ji Weşanxaneyê Apecê, weşan Nr.: 129 hatiye weşandin.
2. Torî-Yezidilik ve Yezidiler. 2000 Istanbul
3. Etem Xemgin – Islamiyete Kadar Kurdîstan Tarihi Cilt-1
4. Etem Xemgin – Kürdistan da Dini inaçlar ve etkiler.
5. Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl- Zargotina Kurda Para I. Moskva 1978.
6. Cîgerxwîn- Tarîxa Kurdîstan Cîld.:1 Stockholm 1985
7. Ekrem Cemîl Paşa –Dîroka Kurdistan bi kurtebirî. Çile 1995 Bruksel.
8. Herodot- Historien- Deutsche gesamtausgabe, Übersetzt von A.Horneffer. Stuttgart 1955-
9. Avyarov, Osmanli-Rus ve Iran savaşlarında Kürtler 1801-1900. Ankara 1995 . Osmanlicadan Tercüme eden : Muhammed(Hoko) Varli(Xanî)
10. Mirjo Salvini- Geschichte und Kultur der Urartäer- Darmsatdt:Wiss.Buchges.,1995
11. Pîr Xidirê Silêman & Xelîlê Cindî- Êzîdiyatî, li ber ronahiya hindek têkistên ola Êzîdîyan- 1995
12. Pîr Xidirê Silêman- Êzîdiyatî- 1996.Dihok.
13. <http://members.nbci.com/avrasya/depo1/yazma.htm>,: Yazma *Van Tarihi*nden Notlar: VAN'DA YEZİDİLERLE KANLI SAVAŞLAR
14. <http://www.folklorkurumu.org/folklora/yoreler/van/asiretler.htm>,
15. M.Emin Bozarslan, Tarihteki ilk Türkçe Ansiklopedde Kürdistan ve Kürdler- Mart 2001 Istanbul, Weşanên Deng:51-
16. <http://www.geocities.com/barzani2000/zaki/index.html>,-Mohemed Emîn Zekî Beg, Kurtiyeke Mêjûwa Kurd û Kurdistanê -

*\* Ev nivîsa min di Kovara Laliş, Hêjmar:17. Dihok 2002 de bi navê -ÊZÎDIYATÎ HAVEYNÊ MIROVATIYA MEZOPOTAMIYA YÊ Û BI TAYBETÎ JÎ XIZNA NASNAMA GELÊN KURD E.- hatiye weşandin.*